Jina Kurd di warê hunerî de

Dîlan Zivngî

Miltên di warê hunerî de , zengîn û dewlemend bi balkêşî rola xwe di pêvajok û şaristaniya dîroka mirovane de nîşan didin . Miletê kurd jî , yek ji miletên di vê warî de dewlemend û zengîn e ligel ku , ji sedê salan ve bindest û dapeşkirî ye ,li encama wê yekê , ji hêla dijmin û neyaran ve, têra xwe tore û hunera kurdî hatiye dizîn û bincil kirine. Lê di sira jin û mêrên gelê me yê Kurd e û nemaze jina kurd ji zû ve, li hunera gelê xwe xwedî derketiye û ew ji windabûnê parastine . Ma kî nizane ku , jina kurd di warê paristina hunerê de xwedî roleke mezin e ; dema mêr û xortên kurd diçûn şer û cengan, jinan li ber darê dergûşê, bi dengên xwe yên xweş û zîz stran û lorîn digotin . Di warê evîn , serpêhatiyên civakî , dewat û Şahiyan de jî ,pir stran , hevalok Û h.w.d digotin . Ev yeka di çêrok û stranên kevnar de baş diyar e, hunermendê hêja Şivan perwer di stranên xwe de tîne ziman û weha distrê: ..Delorî lorî kurê min lorî .. Bavê te kuştin dayîk bigorî .. Ji roja - roj ve, jina kurd sergovend e .

Lê çi qas mixabin , hino -hino jin ji jiyana hunerî bi dûr xistin û rola wê bincil kirin !

Di roja me îro de , kurdên me li seranserî çarperçeyên kurdistanê , bi şahinazî di warê hunerî de li pêş xelikê cîhanê , rola xwe di pêvajoka şaristaniya cîhanê de nîşan didin . Bêguman pir cure û şaxên huneran hene wek : stran , mizîk , şano , reqis û sema , çêrok , wêje wênekêş û h.w.d . Vêca jî , eger em bixwezin bi gelemperî li ser hunera kurdî rawestin , pir şev û roj jê re divên, wisan jî merem û dilxweziya me ew e ku , bi kurtebirîn li ser rewşa jina kurd di warê stranan de, nemaze jina kurd li perçê sûriyê ji kurdistanê rawestin.

Weke xuyaye , gelê kurd di rojhilata navîn de bêtirî miletên dî , di bin

bandora ola Îslamî û sîstema bavan de, mafên jinan , di hin cure û şaxên hunerê de bincil û qedexe kirine !.

Pir asteng û kelem , di riya wê de , çandine. Lê tevî wê yekê jî , ji zû ve, li sê perçên Kurdistan tirkiyê , Êraq , Îran kêm zê de, navên jinên dengbêj , di dîroka hunerî de diyar û aşkere bûne, nimûne : Merym- xan , Eyşeşan , Gulbhar û H.W.D , di roja me îro de jî , bi dehan jinên degbêj hene weke : **D.R(9)**